NEWROZ

Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988

Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê ~ YEKÎTÎ*
Email : Newroz95@hotmail.com

Hejmar(62) | Subat | 2005 z-2616 k | Buha (15) p.s

Rêz û silav li civata 14-ey Hizêrana 1957–an

Li havîna sala 1957-an, roja 14-ey Hizêranê li bajarê Helebê, li mala Mihemed Elî Xoce ji Mabeta civateke dîrokî dihate lidarxistin, tê de biryara aşkerekirina damezrandina yekemîn partiyeke siyasî bona Kurdên Sûriyê dihate dan. Beşdarên wê civata bi nirx ya ku bargiraniya wê biryarê hildabûne ser milan û li xwe girtibûn, heft camêr bûn, jê sê hê saxin û çaran jî koç barkirine, rehma Xwedê li wan be, Ji mamoste **Mihemed Elî xoce** de bigir, di parêzer **Şewket Nesanê** Tilifê re derbazbe, ta tu bigihê **Hemze Niwêranê** Qeremanê û têkoşerê navdar **Osman Sebrî** ji Kurdistana Bakur .

Yek ji hersê camêrên ku hê sax dimînin û dijîn, birêz **Reşîd Hemoyê** Hopka ye, yê dî **Dr. Xelîl Mihemedê** Keferdelê jorî ye, û yê dîtir Sekretêrê Parta demokrat a kurd a pêşverû li Sûriyê mamoste **Hemîd Derwîş** e.

Wê hingê ango ji berî 48 salan, kesên xwedî (birovê û lîse) di nav kurdên Sûriyê de li ser tiliyan dihatin jimartin. Civaka Kurdan çi li Cizîrê, Kobaniyê, çi jî – kêm zêde – li kurdaxê, civakeke dûrî bajarvaniyê li şûn bû, bingeh û stûnên wê yên sereke xwedîkirina pez û cotê dewêr bû, gundîtî, têkiliyên axatî, eşîr û êlperestî, digel cîgehekî xurt ya rol û kartêkirina dîndiyanetê **D.R (11)**

Pîroznamê

Bi şahî û coşeke pir mezin , nûça girêdana perlemana Kurdistana federal , lihevdukirina herdu partiyên sereke (P.D.K) û (Y.N.k) ,û pejirandina xoşewîstê hêja Kek Meshûd Berzanî serokê giştî ji Kurdistana federl re,giha gelê Kurd **.**

Bêguman, ev yeka encama vîn û cefukêşiya dilerên gelê kurd e, nemaze nemirên mina Şêx Sehîdê pîranî, Qadî Mihemed, Mele Mistefa Berzanî û kesên xwedî viyan ku , bê westan liberanberî evqas sal,xwe dane ser riya **D.R(9)**